

**Ji Min Re Qala  
Mesîh Bike**

**L.M. Abdullah**

**Müjde Yayıncılık Ltd.Şti**  
Vişne Sok No:4/11  
Kadıköy/ İstanbul

© Mjde Yayincılık Ltd. Őti'ne Aittir

**NavîŐana xwestinê:**

P.K. 358 Kadıky

İstanbul

**ISBN 975 - 7889 - 94 - 6**

© L.M.Abdullah 1996

'This translation of 'Messias', originally printed in Swedish is published with the permission of the copyright holder.

1.inci Baskı Eylül 2001

Mafê çapê parastî ye.

**KurtiŐ Ofset Matbaacılık**

2001 İstanbul

# Naverok

Ahmed û Hemdî.....	4
Berxê Xwedê.....	6
Peyva Xwedê.....	10
Qurbana Xwedê.....	14
Guneh.....	20
Kurê Birahîm.....	26
Xwedê Yek e.....	32
Xwedê û Mirov.....	39

## AHMED Û HEMDÎ

Ahmed li broyekê dixebitî. Ne rast e ku mirov bêje ji karê xwe razî nebû. Belê ji bo wî, bi şefê beşa wî ya ku fersenda xwe îspatkirinê jê re nedinasî, derbaskirin gellek zehmet bû. Kîngê ku projeyeke baş û berbiçav ji beşa ku ew lê dixebitî re bihata, patron tenê bi serê xwe li hemû para şanaziyê xwedî derdiket.

Ahmed gellek caran fikirîbû ku karê xwe biguhêre. Belê karên ku rayî dikirin hem pirr wusa hêvîdar nebûn, hem jî dîtina karekî baş wusa rihet nebû. Îcar ji xwe niha perê ku distand, ji karên ku karibû bibîne piçekê bêtir bû. Ji ber vê yekê ew ji şirketa ku lê dixebitî neqetiya. Ji bo derbaskirina xanima xwe û sê zarûkan, diviya pereyekî ku dikare pê derbasiya xwe bikira bistanda. Ahmed bi zarûkên xwe, bi tayabetî jî bi kurê xwe Hesên ê ku di unîversîteyê de muhendîsî dixwend pirr serbilind bû.

Rojekê ji rojan, li dera kar tiştekî ku rewşê rast kir pêk hat. Hemdî hat dera ku Ahmed lê dixebite. Hemdî ji Ahmed piçekê ciwantir bû; hergav dilê wî xweş û rûgeş bû. Bi wî re baş dihat derbaskirin. Ahmed di dawiyê de li dera kar ji bo xwe hevalekî dîtibû. Bi vî awayî wan deşt pê kir, nîvro bi hev re çûn xwarinê, êvaran jî bi hev re ji cihê kar derketin. Hemdî jî zewicandî bû û Xwedê du kur û du keç dabû wan.

Ahmed û Hemdî di demeke kurt de bûn dost û êdî misêwa hevdû li malên hev ziyaret kirin. Herduyan jî ji sohbeta bi hev re û çayvexwarinê hez dikirin. Gava ku

dihatin ba hev seat gellek zû derbas dibûn. Hema bibêje di her mijarê de tiştên ku li serê bipeyivin didîtin.

Di serî de bi pirranî ji karê xwe yên buroyê dipeyivîn. Belê dû re dest pê kirin li ser karên girîng ên jiyane jî rawestîn. Ahmed jî, Hemdî jî gelek dîndar bûn; belê heryek ji dînekî cihê bû. Ahmed Misilman bû, belê hevalê wî yê herî nêzik Hemdî, bi pergala Kitêba Pîroz dixwend û li ser şopa Îsa Mesîh bû.

Ya ku Ahmed şaş hêştibû ev bû: Wî çiqas bêtir Hemdî ji nêzik ve nas dikir, ewqas jî ji dîne wî û ji jiyana wî ya bi Xwedê re hurmet nîşan dida. Ahmed têgihîşt ku di navbera hevalê wî û Xwedê de têkiliyê nêzik heye û ew bi vê gellek şa ye. Wî tu car hîsseke weha tam nekiribû. Ev yek ji bo wî bû meraq. Ahmed dizanibû ku jiyana Hemdî ya bi Xwedê re, bi Mesîh re têkildar e. Wek Hemdî nebe jî, Ahmed jî bi awayekî bawerî bi Mesîh dianî. Wî ji hemû tiştên ku di Quranê de li ser Îsayê kurê Meryemê hatibûn nivîsîn bawer dikir. Wî dizanibû ku Mesîh ji Meryema nezewicandî çêbûye, bi destûra Xwedê gellek karên nedîtî kirine û ji Xwedê Mizgînî (Încîl) sitandiye. Ahmed, di vê navê de fêma kir ku her tiştên ku li ser jiyana Mesîh dizane tenê çend tiştên biçûk in. Hingê daxwaza hînbûna wî ya li ser vî şandiyê Xwedê yê ku di Quranê de gellek navên wî hene, zêdetir bû.

Di encamê de Ahmed bi meraqa xwe nikaribû û rojekê biryar da ku li ser Mesîh ji dostê xwe Hemdî hin tiştan bipirse. Vê biryara wî, ji peyivînen wan ên balkêş re bû sedem.

## BERXÊ XWEDÊ

Ahmed ji dil û can ji Hemdî re weha got, “Ji min re qala Isayê kurê Meryemê bike. Bi rastî ez dixwazim di derheqê wî de gellek tiştan bizanibim.”

Hingê Hemdî piçekê fikirî û jê re got, “Heke tu bixwazî hîn bibî ka çima Mesîh hat dinyayê, hingê divê tu bi mana qurbanê bizanibî.”

Ahmed bi meraq jê pirsî, “Qurban? Qurbana çi?”

Hemdî weha berdewam kir, “Em mana qurbanê di Cejna Qurbanê de dibînin. Ez ji xwestina Xwedê ya ji Birahîm a ku kurê xwe qurban bike qal dikim. Heke Xwedê di şûnû wî de fîdyeyek neda, wê bi kurê wî Birahîm çi bibûya?”

Ahmed got, “Wê Simaîl bimira.”

Hemdî lê vegerand û got, “Mana qurbanê ev bi xwe ye. Di şûna yekî de mirina yekî din. Xwedê, ji bo ku di şûna kurik bê qurbankirin de beranek da. Ez jî wek kurê Birahîm bûm û di bin hukmê mirinê de bûm.”

Ahmedê ku piçekê şaş mabû, ji Hemdî re got, “Tu dixwazî çi bêjî?”

Hemdî bi dengê ji dil weha got, “Ev di Kitêba Pîroz de hatiye nivîsîn”

**“Çimkî bedelê guneh mirin e<sup>1</sup>.”**

---

<sup>1</sup> Încîl: Nama Romayîyan 6:23

## Berxê Xwedê

“Bedelê guneh mirin e. Ez gunehkar im. Rast e, mirovên din min gellek dîndar dibînin. Ez her roj ji Xwedê re dua dikim, kitêba wî dixwînim, ji wî re xizmet dikim. Belê ez li ber Xwedê gunehkar im. Ma xên ji Xwedê yekî bêqusûr heye?”

Ahmed got, “Na, xên ji Xwedê tu kes tune.”

Hemdî got, “Nexwe em hemû li pêş Xwedê gunehkar in, newsa?”

Ahmed got, “Erê, ev rast e.”

Hemdî got, “Nexwe wusa be ez jî bi kurê Birahîm re di eynî rewşê de me, di bin hukmê hêza wî ya mirinê de me. Belê qurbana ku ji bo gunehên min hat dayin li kuderê ye? Ma Xwedê, ji bo ku di ber min de jî fîdye bê dayin qurbanek neşand?” Ahmed baş nizanibû ku çi bibêje. Hemdî berdewam kir û got; “Yuhennayê Îmadkar di dema Mesîh de jiya. Cara pêşî gava ku Mesîh dît weha got:

**‘Va ye, Berxê Xwedê yê ku gunehên dinyayê hiltîne!’<sup>2</sup>**

“Mesîh ne berxê mirovan bû. Ew ji Xwedê hat, ji jor ve daket. Ruhê Xwedê yê Pîroz Meryema bakîre nixamt. Meryem bi zarû ma û kurek anî. Wek ku tu jî dizanî ji bo wî, “Îsayê Meryemê,” “Peyva Xwedê û Ruhê Xwedê” tê gotin. Ew wek Berxê Xwedê ji cinetê hatibû. Mesîh, bi jiyana xwe ya bêqusur a li pêş Xwedê îspat

---

<sup>2</sup> Încîl: Yûhenna 1:29

kir ku ew Berxê Xwedê ye. Ji ber ku ew Berxê Xwedê yê bêqusur bû, wî tu car negot, ‘Ez ji Xwedayê Berz efûkirinê dixwazim.’ Ji ber ku ew, wek Berxê Xwedê yê ku gunehên dinyayê ji holê rake hat, divîyabû ku ew bê qurbankirin. Ev bûyer, bi daxwaza wî ya bi fedakirina jiyana xwe pêk hat. Ew ji mirinê vejîya û bi saxî derket ezmanan. Û rojekê ewê were dinyayê.”

Hemdî demekê bédeng ma, li Ahmed nihart û weha got, “Ez jî bi kurê Birahîm re di eynî rewşê de me, di bin hukmê mirinê de me. Belê bi saya Berxê Xwedê yê pak û paqij Mesîh, qurbanek ku di ber gunehên min de hatiye dayin heye. Îcar niha Xwedê bi saya Berxê xwe, ji bo hemû gunehên me bexişandin û di cinetê de jiyaneke herheyî pêşkiş dike. Mesîh, gunehên te jî tê de Ahmed, gunehên hemû mirovatiyê hilgirt.”

Ahmed demeke dirêj fikirî û bê peyivîn rawest. Dû re weha got, “Heke Mesîh hemû gunehên dinyayê hilgirtibe, hingê ne hewce ye ku ez bimirim... Nexwe ez ji niha ve xwedî jiyana herheyî me.”

Hemdî jê re got, “Binêre Ahmed, em bêjîn ku îro rojbûyina te ye. Mesîh pakêtek di dest de tê, li derê te dixê û dibêje, ‘Ahmed, ez dixwazim diyariyekê bidim te. Ev diyarî ji bo hemû gunehên te bexişandin, jiyana herheyî û ji îro pê ve têkiliya te ya jîndar a bi Xwedê re ye. Belê hin şertên vê hene. Divê tu gunehên xwe li xwe deynî, berê xwe ji wan bizivêrî û ji bo ku min di ber te de jiyana xwe bi fîdyetî qurban kirye, efûbûnê



qebûl bikî. Heke tu vê diyariyê qebûl bikî, ev ya te ye. Belê bi awayekî din nikare bibe ya te.”

Ahmed di ciyê xwe de rûniştî li ser van tiştên ha difikirî. Serê wî tevlihev bûbû û nizanibû ku çi bêje. Hemdî jê re got. “Dibe ku ev bersîv ji te re lêzêdekirî bê. Belê gava ku xizmetkarekî Xwedê, riya ku bi saya Mesîh diçe Xwedê ji te re diyar dike, ev wek wê yekê ye ku bi rastî jî Kurê Meryemê, Îsayê ku vejyaye û diji li derê te dixê. Ew bi xwe di Încîlê de weha dibêje:

**‘Va ye ez li ber derî rawesta me, li derî dixim. Heke yek dengê min bibihîze û derî veke, ezê herim ba wî; ezê bi wî re û ewê jî bi min re, emê bi hev re xwarinê bixwin.’<sup>3</sup>”**

Hemdî weha berdewam kir, “Derê xwe li Mesîh vekirin, nanê xwe bi wî re parîkirin û ji bo ku bi min re hevpariyê bike vexwendina wî ya jiyana min, bi qebûlkirina diyariya Xwedê re eynî tişt e. Ev ji bo min jî, ji bo herkesî jî weha ye.”

Ahmed ji Hemdî re got, “Hemdî, ez dixwazim tu bizanibî, tiştên ku te li ser Mesîh ji min re got ji kûrî ve tesîra xwe li ser min nîşan dan. Divê ku ez li ser tiştên ku em peyivîne bifikirim. Belê cardin gava ku em hatin ba hev, ez dixwazim ku tiştên hê zêde li ser Mesîh hîn bibim.”

“De niha bi xatirê te.”

“Oxir be Ahmed.”

---

<sup>3</sup> Încîl: Peyxam 3:20

## PEYVA XWEDÊ

Ahmed piçekê fedîkirî weha got, “Tiştên ku te cara din li ser Îsayê Kurê Meryemê ji min re gotin, ji bo min fersenda fikirîna gellek tiştan çêkir. Ez bawer im ku tê acis nebî, belê beriya ku em li ser Mesîh bipeyivin, gellek pirsên min ên ku ez dixwazim tu bersîvên wan bidî hene.”

Hemdiyê ku texmîn dikir ewê Ahmed jê çi bipirse, jê re got, “Kerem ke, bipirse.”

Ahmed bi awayekî fedîyok weha dest bi axaftina xwe kir, “Tu dizanî ku em Misilman bi Tewrat (Di Kitêba Pîroz de pênc kitêbên ku Musa nivîsandine), Zebûr (Mezmûrên Dawid) Încîl (Mizgîniya Îsa) û Quranê, wek kitêbên ku ji ezmanan hatine bawer dikin. Belê bi awayê ku bi min hat hînkirin, xên ji Quranê, hemû kitêb ji alî Cihû û Xirîstiyanan ve hatine guhartin û ji ber vê yekê êdî ne mumkun e ku mirov bawerî bi tiştên ku di wan de hatine nivîsîn, bîne. Ji ber vê yekê Kitêba ku hûn bawerî pê tînin xerabûye û tevliheviya derew û rastiyan e.”

Hemdî got, “Ma gelo tu dikarî tu delîlekî dîrokî yê ku vê fikrê destek dike nîşanî min bidî?”

Ahmed piçekê fikirî, belê matmayî hay jê çêbû tiştên ku bihîsîtiye nehatine îspatkirin û tenê gotin in.

Hemdî berdewam kir û got, “Ma bi vê gotinê, tu dikarî ji min re bêjî ku guhartin kîngê çêbû û bi çi awayî pêk hat?”

Ahmed piçekê şaş mayî weha got, “Bi rastî ez nikarim bêjim. Kesî bersîva van pirsên esasî neda min.”

Hingê Hemdî ji Ahmed re weha got, “Ma tu dikarî li ser mumkuniya xerakirina Quranê bifikirî?”

Ahmed bi hêrs got, “Ev çi ye, ev çi gotin e. Tiştek weha bi tu awayî çênabe. Bawermend bi tu awayî destûr nadin ku yek wê biguhêre.”

Hemdî jê re got, “Çawa tê bîra te ku em ji bo Kitêba Pîroz cihê difikirin? Bi rastî ez şaş dimînim ku tu çawa bawerî pê tînî ku Kitêba Pîroz hatiye guhartin û bawarmendên rastîn Kitbê Pîroz a qelb û guhartî pêşkişî me dikin. Baweriya min bi wî Xwedayî ye ku erd û ezman afirandiyê û hêza wî digihîje her tiştî. Xwedayê ku peyva xwe daye mirovatiyê, helbet hêza wî heye ku wê ji xerabûnê jî biparêze.”

Hemdî bi çavên xwe li Ahmed nihart û weha got; “Binêre Ahmed, bi rastî jî tu bawer dikî ev tiştên ha yên ku çêbûne li gor daxwaza Xwedê bin?”

Ahmed got, “Erê, ez ji vê bawer dikim.”

Hemdî got; “Ma tu bi rastî jî bawer dikî ku Xwedê berê peyva xwe da dinyayê û dû re jî destûr da ku peyva wî bê guhartin? An ku tu difikî Xwedayê Berz nikare peyva xwe ji xerabûnê biparêze?”

Ahmed got, “Bêguman Xwedê dikare gotina xwe ji xerabûnê biparêze.”

## PEYVA XWEDÊ

Hemdî got, “Ahmed, ma tu zanî ku Kitêba Pîroz kibêke bêhempa ye? 1400 sal berê hatiye nivîsîn. Tê de Tewrat, Zebûr, Încîl û hê gellek beşên din ên ku ji alî şandî û pêxemberên Xwedê ve hatine nivîsîn hene. Kitêba Pîroz ji du beşan pêk tê. Ji ya ku beriya bûyina Îsa Mesîh digire nav xwe re Peymana Kevin, ji ya ku bi hatina Mesîh a dinê dest pê dike re Peymana Nû tê gotin. Kitêba Pîroz bi sê zimanên cihê hatiye nivîsîn.”

Ahmed bi meraq pirsî, “Ma bi kîjan zimanan?”

Hemdî lê vegerand, “Bi Îbranî, bi Aramaî û bi Grekî hatiye nivîsîn. Xwedê, ji bo ku peyva xwe bigihîne, gellek mirovên cihê xebitand. Ji vana hinek padîşah û mirovên dewletê, hinek jî şivan û masîvan bûn. Kitêba Pîroz mucîzeyeke ji alî Xewdê ve ye, çimkî di gel ku di demeke gellek dirêj û ji alî gellek kesan ve hatiye nivîsîn jî, yekîtiyeke bêhempa pêk tîne. Di tevahiya Kitêba Pîroz de naverokê heye, ev naverok jî Mesîh e.”

Ahmedê ku şaşa û mat mabû, pirsî, “Ma rast e ku Xwedê 1400 salan ji Mesîh qal kiribû?”

Hemdî bi bişirîn got, “Ahmed, Xwedê di tevahiya dîrokê de, ta heta roja me ji Mesîh peyivî ye.”

Ahmed bi şok pirsî, “Ma bi rastî jî ev mumkun e?”

Hemdî got, “Bêguman mumkun e. Çimkî her tişt li ba Xwedê mumkun e. Belê em carake din li ser vê pirsê rawestin.

Ahmed got, “Bi rastî jî ez vê gellek dixwazim.”

“Bi xatirê te.”

“Oxir be.”

## QURBANA XWEDÊ

Ahmed got, “Bi rastî jî ez meraq dikim, ka gelo çawa di tevahiya Kitêba Pîroz de naveroka ku li ser tê rawestin Mesîh e.”

Hemdî got, “Ma ew roj tê bîra te ku me gotibû Mesîh, Bêxê Xwedê yê ku gunehên me hildigire ye.”

Ahmed got, “Bêşik tê bîra min, ma ez çawa dikarim vê jibîr bikim.”

Hemdî got, “Xwedê, heta dema Îsayê Kurê Meryemê li ser qurbanê hin tişt hînî mirovatiyê dikir.”

Ahmed got, “Çawa?”

Hemdî pirsî, “Ma di dema Habîl û Kabîl de li ser dinyayê çend kes hebûn?”

Ahmed piçekê fikirî û got, “Çar kes. Adem, Hewa, Habîl û Kabîl.”

Hemdî got, “Tenê çar kes bûn. Belê di gelê vê yekê dizanibûn ku divê bi qurbanekê biperizin Xwedê. Ma gelo çawa bi vê yekê dizanibûn? Xwedê saf û pîroz e, belê ji ber ku mirov gunehkar e, ji bo gunehên wî hewcedariya wî bi fîdyeyekê heye.” Hemdî weha berdewam kir, “Ez jî bi awayê ku şandî û pêxember diperizîn, diperizim Xwedê.”

Ahmed bişirî û got, “Na, nîha tu henekan dikî. Ji bo ku tu ji Xwedê re bikî qurban, tu naçî bazarê û beranekî nakirî.”

Hemdî got, “Ez bi saya Berxê Xwedê yê ku gava ji Xwedê re hat qurbankirin gunehên min hildigirt, diperizim Xwedê. Kitêba Pîroz weha dibêje:

**‘Çimkî tenê Xwedayek û di navbera mirovan û Xwedê de tenê mabeynkarek heye. Ev mirov jî Îsa Mesîh e ku xwe ji bo herkesî bi fîdyetî pêşkiş kiriye<sup>4</sup>.’”**

“Îcar tenê Xwedayek û tenê mabeynkarek di navbera me û Xwedê de heye. Ew jî Mesîh e û tu tê de, xwe ji bo herkesî fîdye kiriye. Îcar heta îro, di tevahiya dîrokê de, mirov hergav bi qurbanekê perizîn Xwedê.”

Ahmed bi fikirîn got, “Min şitrê ez hêdî hêdî tiştên ku tu dibêjî fêm dikim. Belê piçêke din jî diyar bike ku ez bikaribim tevahiya sûret bînim ber çavê xwe.”

Hemdî bi vî awayî bersîv da wî, “Xwedê, di tevahiya dîrokê de mane û armanca qurbanê, bi taybetî bi Musa û bi mabeynkariya Tewratê nîşanî mirovan daye. Di ayetên Kitêba Pîroz de, Şerîeta Pîroz a li ser fîdya di ber guneh de eşkere ye:

**‘Ji xwe li gor Şerîeta Pîroz, hema bibêje her tişt bi xwînê tê paqijkirin û bê rijandina xwînê efûbûn çênabe<sup>5</sup>.’”**

---

<sup>4</sup> Încîl: Tîmoteyoso I. 2:5-6

<sup>5</sup> Încîl: Nama Îbranîyan 9:22

## QURBANA XWEDÊ

Ahmed bi meraq pirsî, “Baş e çi têkiliya Îsa bi hemû van qurbanan re heye?”

Hemdî got, “Eynî wek hîndariya li ser qurbanê, di derheqê Mesîh de jî gellek pêxemberî hene. Di van pêxembertiyan de tê gotin ku gava Mesîh were dinyayê wê di ber gunehên me de bi fîdyetî bê qurbankirin.” Hingê Hemdî Kitêba Pîroz vekir û perçeyekî ku li ser vê mijarê ye, nîşanî Ahmed da. Hemdî got, “Tu bi xwe bibîne ku Pêxember Yeşeya hê 700 sal beriya ku Mesîh were li ser qurbanbûna wî çi dibêje.”

**“Esasen wî nexweşînên me hilgirt**

**Êşên me kişand**

**Me jî got qey**

**Ew ji alî Xwedê ve hat cezakirin**

**Hat pelçiqandin.**

**Ya rast, ji ber serhildêriya me**

**Bedena wî hat qulkirin.**

**Ji ber sucên me wî eziyet kişand.**

**Cezayê ku ji bo aştiya me pêwist bû**

**Li wî hat birrîn.**

**Em hemû wek miyan ji rê derketibûn,**

**Her yek ji me li riya xwe zivirî.**

**Dîsa jî Xudan cezayê me hemûyan li wî kir.**

**Di gel ku wî tada dît, eziyet kişand,**

**Wî devê xwe venekir.**

**Wek miya ku dibin serjêkirinê**

## QURBANA XWEDÊ

**Wek mêşina ku bêdeng li ber hevrîngvanan radiweste Wî devê xwe venekir<sup>6</sup>.”**

Pexembertiya li ser Mesîh ji kûr ve tesîra xwe li ser Ahmed nîşan dabû. Ahmed şaşmayî weha got, “Ma tu dibêjî ku ev bi sedan salan beriya ku Îsayê kurê Meryemê were dinyayê hatiye nivîsîn.?” Hemdî got, “Erê, li gor pêxemberan, diviyabû ku Mesîh ji nifşê Dawid ê ku bi qasî hezar salî beriya wî jiyabû, bihata. Dawid, li ser kurê xwe Mesîh ê ku wê bihata xaçkirin, bi awayekî vebir nivîsîbû. Îcar xaçkirin, cureyek îdamê yê hêdî û bi êş bû. Hestiyên yekî ku demekê li xaçê dima, ji movikan derdiketin û wî kesî tîbûneke ecêb dikişand. Dawid Pêxember weha dinivîse:

**‘Ez wek avê dirijim,**

**Hemû hestiyên min ji movikan dertên,**

**Dilê min wek şimayê di hundirê min de dihele.**

**Hêza min wek perçê kodikê hişk bû.**

**Zimanê min bi ezamanê min dibe,**

**Te ez li axa mirinê vezelandim.**

**Kûçikan dor li min pêçan,**

**Keriyên xeraban dora min digirin.**

**Destê min, lingê min qul dikin.**

**Û min hemû hestiyên xwe jimart.**

**Dijminên min, çavên xwe qutane ser min, li min dinêrin.**

**Kincên min di nav xwe de parî dikin**

---

<sup>6</sup> Tewrat, Yeşeya 53:4-7



**Li ser wan peşt davêjin.<sup>7</sup>**

Di dema ku Dawid dijiya de cezayê îdamê bi awayê xaçkirinê nedihat bicihanîn. Di gel vê yekê Dawid ev nivîsandiye. Cezayê xaçkirinê, di dema Mesîh de ji alî Romayîyan ve hatiye bikaranîn.”

Ahmed got, “Niha tu dibêjî ev hemû kehanet di Îsayê kurê Meryemê de hatin cih?”

Hemdî got, “Erê, belê tenê ne ev, hê gellek pêxembertiyên din jî herf bi herf di Mesîh de hatine cih. Mesîh gellek caran gotiye ku ew, ji bo ku jiyana xwe bi fîdyeyî bide hatiye. Îsa li ser xwe weha gotibû:

**‘Çimkî Kurê Mirov jî nehatiye ku jê re xizmet bê kirin, lê hatiye ku xizmetê bike û di ber gellekan de canê xwe berdêl bide<sup>8</sup>.’**”

Hemdî got, “Ahmed, niha tu fêm dikî ku Xwedê di ber gunehan de qurbankirinê di tevahiya Kitêba Pîroz de çawa hîn dike û ev hemû çawa di Mesîh de tên cih?”

Ahmed got, “Binêre Hemdî, min berê qet ev yek nebihîstibû. Ev gellek balkêş e. Ji bo ku ez li ser bifikirim hewcedariya min bi gellek wextê heye. Belê meraq neke, hê pîrr wext derbas nebûye, ezê bi gellek pirsên xwe yên din cardin bêm.”

---

<sup>7</sup> Zebûr, Mezmûr 22:14-18

<sup>8</sup> Încîl: Marqos 10:45

## QURBANA XWEDÊ

Hingê Hemdî got, “Ji kerema xwe, vê Kitêba Pîroz wek diyariyeke ji min qebûl bike. Tu ji bêşê Încîlê yê ku jiyana Mesîh, hîndariya wî û mûcîzeyên wî yên awarte dest bi xwendina xwe bike”

Ahmed got, “Ez gellek sipas dikim, min li ser kesên ku Kitêbê heq dikin gellek tişt bihîstibû, belê min Kitêbê bi xwe berê nexwendibû. Ez ji dil dixwazim ku hîndariya Îsayê kurê Meryemê û mûcîzeyên wî bixwînim.”

“Bi xatirê te.”

“Oxir be.”

## GUNEH

Ahmed fedîyokî dest bi axaftina xwe kir û got, “Hemdî, ez ji hevdîtina me ya çûyî vir ve li ser Mesîh û jiyana xwe di ber gunehên mirovan de dayina wî difikirm. Ma gelo guneh ji kuderê tê û sedemê ku mesela hemû mirovan bi guneh re heye, çi ye? Ma gelo tu dikarî vê yekê diyar bikî?”

Hemdî fikirî û got, “Ez dibêjim qey ezê bikaribim. Belê ji bo ku em fêhm bikin guneh ji kuderê tê, divê em herin destpêkê. Em di Tewratê de dixwînin ku Xwedê, piştî ku dinya û mirov afirandine, mirov di cinetê de bicih kiriye. Li wir, ango li cinetê mirov bi tevahî saf û paqij bû û bi Xwedê re, di nav têkiliyeke bêqusur de bû. Belê wek tê zanîn, bûyereke ku jiyana cinetê xerakir, rû da. Ma ev çi bû Ahmed?”

Ahmed got, “Şeytan hat û hemû tişt xera kir.”

Hemdî got, “Rast e, Xwedê ji Adem re got, **‘Tu li baxçe, fêkiyê her dara ku tu dixwazî dikarî bixwî. Belê ji dara qencî û neqenciye zanîne nexwe. Çimkî roja ku tu ji wê bixwî, tê bimrî’**”

“Belê Şeytan di şeklê mar de hat, Adem û Hewayê xapand. Ew jî li hember Xwedê rabûn û ev fêkî xwarin.

---

<sup>9</sup> Tewrat, Afirandin 2:16-17

Di encama vê de ji bo mirovatiyê hilweşîn hat. Ji ber ku guneh ket jiyana mirovatiyê, herkes gunehkar bû.”

Ahmed bi awayekî bi şik pirsî, “Ma bi rastî jî herkes bû gunehkar? Qebûlkirina vê yekê ji min re zehmet tê. Heke ev rast be, herkes bi çi awayî bû gunehkar?”

Hemdî got, “Mirovatî bû wek wê fêkiya ku xwar. Bû wek tevheviyeke xerîb a qencî û xerabiyê. Carna mirovek dikare tiştên herî çê bike, belê demekê bi şûn de jî dikare tiştên herî xayin bike; heta dikare cîranê xwe bixapîne û bişêlîne. Mirovek ji bo demekê dikare tije evîn û heskirîn be, belê demekê bi şûn de dikare dilreş be, li pey zewqa xwe here û gunehkar be. Wek ku te jî got Ahmed, hemû mirovatî bi vê pirsê re tekoşîn dike. Her dîn li ser vê pirsê radiweste. Her netewe, ji bo ku hin cureyên guneh têxe bin kontrolê qanûnan dertîne. Tiştê herî xerab, mirov ji ber ku guneh dikin gunehkar nînin, ji ber ku gunehdar in guneh dikin. Tê bêjî qey di hundirê hemû mirovan de fabrîqeyeke biçûk a ku gunehan çêdike heye. Ma ne wusa ye?”

Ahmed got, “Mixabin ku salixê te yê mirovatiyê bi rastiyê re pir diçe ser hev. Belê Şeytan li kudera vî sûretî cih distîne?”

Hemdî got, “Bi saya Şeytan bû ku guneh di jiyana mirovan û civatan de hêz sitand. Şeytanê ku demekê Adem û Hewa ji hev qetand îro jî eynî tiştî dike. Ji bo

ku em di nav guneh de bijîn hê jî mirovan dixapîne. Şeytan di jiyana mirovan de bi saya guneh hêz distîne. Çimkî ya ku me ji Xwedê diqetîne guneh e. Îro, sedemê ku dinya di vî halî de ye, ji ber guneh e. Xwedê her tiştî baş afirand, belê mirovatiyê bi riya şer û tadayê, di gel vê bi têkiliyên xerab û bi gellek tiştên ku jiyana mirov helaq dikin, gellek xerabî aniye dinyayê.”

Ahmed got, “Nexwe tu dibêjî Xwedê em weha neafirandin, belê eger îro dinya di vê rewşê de be, ev ji ber sedemê gunehê Adem e, newsa?”

Hemdî got, “Rast e, guneh bi saya Adem ji mirovatiyê re bû mal. Kitêba Pîroz weha dibêje:

**‘Guneh bi saya mirovekî, mirin jî bi saya guneh ket dinyayê. Bi vî awayî mirin li hemû mirovan belav bû. Çimkî hemûyan guneh kir<sup>10</sup>.’**”

“Îcar encama herî xerab mirin bû. Mirina bedenî û ruhanî.”

Ji çavên wî xuya fikir ku Ahmed mereq dike. Ahmed got, “Mirina bedenî û ruhanî! Ma mirina ruhanî tê çi manê?”

Hemdî got, “Xwedê ji mirov re gotibû heke ew wî fêkiyî bixwe, ewê bimire. Ji ber ku Xwedê rast bû û

---

<sup>10</sup> Încîl: Nama Romayîyan 5:12

hergav li gor gotina xwe tevdigeriya, bi rastî jî mirin bi ser mirovatîyê de hat. Hemû mirov ji ber vê yekê dimirin. Belê gava ku mirov guneh kir, bi awayê ruhanî jî mir.”

Ahmed got, “Çawa?”

Hemdî got, “Ji ber guneh mirov ji cinetê hatibû derxistin. Ew ji wê dera ku bi Xwedê re di nav têkiliyeke saf, paqij û bêqusûr de bû hatibû avêtin. Divîyabû ku mirov li derveyî cinetê bijîya. Gava ku mirov bi destê guneh ji Xwedayê jîndar û pîroz veqetiya, bi awayê ruhanî jî mir. Ji ber vê yekê, tiştên ku mirov ji Xwedê veqetandin, guneh û xerabî ne. Loma em bi Xwedê re ne di nav têkiliyeke nêzik de ne. Ji ber ku Xwedê paqij û pîroz e, ew nikare bi guneh re di têkiliyê de be. Loma hewcedariya me bi Xilaskarekî ku karibe me ji hemû encamên guneh xelas bike heye. Ahmed, ma tu bawer dikî ku tevê gunehên te li derekê qeydkirî ne?”

Ahmed piçekê xemgîn got, “Ez dizanim ku ev ji alî du milyaketên ku mirov dişopînin ve tînin nivîsîn.”

Hemdî got, “Xwedê her tiştê li ser me dizane. Her karê qenc û her karê xerab. Her gotinê, her fikrê, her niyetê. Xwedê her tiştî nivîsandîye. Ma tu dizanî ku di roja hukum de, wê kîjan aliyê teraziya te giran be?”

Ahmed bêdeng got, “Tenê Xwedê bi wê bizanibe.”

## GUNEH

Hemdî bi aramî got, “Xwedê ji te hez dike Ahmed. Ji bîr neke ku Îsayê Meryemê hemû gunehên me girt ser xwe. Ji bo her gunehî bexişandin heye.”

Ahmed piçekê fikîrî û got, “Madem Mesîh evqas girîng e, çima Adem û Hewa li ser wî tişt nebihîstin?”

Hemdî got, “Heke ez ji te re bêjim ku wan jî li ser Mesîh hin tişt bihîstine, tê ji min bawer bikî?”

Ahmed got, “Na, ez texmîn nakim ku wan li ser wî tiştêk bihîstibe.”

Hemdî got, “Xwedê ji mirov hez dike û dixwaze ku pê re di nav têkiliyê de be. Ji ber vê yekê hê ji destpêkê ve ji Mesîh qal kir. Hê gava ku Adem û Hewa tam di nav vê bêkeysiyê de bûn, sozê xilaskarekî ku ewê hêza Şeytan hilîne sitandin. Xwedê ji Şeytan re, li ser Adem û Hewa weha got,

**‘Ezê te û jinê, nîjada te û wê ji hev re bikim dijmin. Wê nîjada wê serê te bipelçiqîne, tê êrîşî paniya wê bikî<sup>11</sup>.’**”

Di tevahiya Kitêba Pîroz de navê kuran û bavan hatiye dayin. Wek kurê Birahîm, kurê Aqub. Belê di vir de Kitêba Pîroz, ne ji nîjada mêr, ji ya jinê qal dike. Yekî ku bavê wî tunebû, belê wê ji jinekê çêbibûya

---

<sup>11</sup> Tekvîn/Afîrandîn 3:15

bihata. Wê Şeytan êrîşî paniya jinikê bikira û bixwesta ku kurê wê bikuje; belê ewê vî kurî, hukmê Şeytan ê li ser mirovan rakira. Gava ku Îsayê kurê Meryemê jiyana xwe di ber gunehên mirovatîyê de bi fîdyetî da, eynî bi vî awayî çêbû.

Ahmed got, “Tiştêkî gellek serdest e. Gellek balkêş e ku Xwedê ji mirovên pêşî yên ku li ser ruyê erdê dijîn re qala Mesîh kiriye. Cardin xuya dibe ku naveroka esasî ya Kitêba Pîroz Mesîh e. Heta careke din gellek tiştên ku dikevin ser min hene Hemdî.”

“Niha di xweşiyê de bimîne.”

“Oxir be.”



## KURÊ BIRAHÎM

Hemdî got, “Ez gellek meraq dikim, gelo tu li ser Încîlê çi difikirî?”

Ahmed ji dil got, “Bi rastî jî Kitêbeke bêhempa ye. Min heta niha tu tiştêk weha nexwend. Xwendina mûcîzeyên Mesîh mirov şaş dihêle, efsûnkar dike. Axaftina Îsa ya li çiyê jî bêhempa ye. Tiştên ku Îsa dibêje gellek vekirî û kur in. Gava ku dibêje ji yên ku dijminên we ne hes bikin û ji bo yên ku bi we ezîyetê didin kişandin dua bikin, hingê ew gellek têgihan serobino dike. Hîndariya wî ya li ser duakirinê ji tiştên ku min berê bihîstine pirr cihê ye. Divê ez bêjim ku vê Kitêbê tesîreke mezin liminkir. Belê di gel vê, di serê min de hê gellek jî pirs çêbûn.”

Hemdî got, “Balkêş e! Newxe em ji pirsê te ya pêşîn dest pê bikin.”

Ahmed got, “Gelo çima Încîl, bi malbateke ku bi Birahîm û Dawid dajo, ji wir jî tê Mesîh dest pê dike?”

Hemdî piçekê fikirî û weha got, “Ma gelo tê bîra te ku berê em li ser peyivîbûn û me gotibû ku Kitêba Pîroz yekpare ye û tevahiya Kitêba Pîroz bi vê yekparetiyê dajo?”

Ahmed got, “Belê, tê bîra min.”

Hemdî got, “Ma tu dizanî ku ew mijar çi bû?”

Ahmed got, “Mesîh bû.”

## KURÊ BIRAHÎM

Hemdî got, “Bersîva pirsê bi vê mijarê re têkildar e. Li gor pêxemberan divîyabû ku Mesîh kurê Dawid û Birahîm bûya.”

Ahmed li ser tiştên ku Hemdî gotin fikîrî û got, “Tiştên ku tu dibêjî balkêş in, belê tu dikarî piçekê li ser van pêxemberên cihê bipeyivî?”

Hemdî, piştî bêdengiyê dirêj weha dest bi axaftina xwe kir, “Nêzikî çar hezar salê berê, rojekê Xwedê, bi Birahîmê ku dostê Xwedê dihat zanîn re, peyivî. Hê gava ku navê Birahîm Abram bû, Xwedê li ser navê mirovatiyê sozekî girîng da wî. Em di Tewratê de weha dixwînin,

**‘Xudan ji Abram re got, ‘ Welatê xwe, gelê xwe, mala bavê xwe bihêle û here wê axa ku ezê nîşanî te bidim. Ezê te bikim neteweke mezin. Ezê te pîroz û navdar bikim. Tê bibî kaniya bereketê. Ezê yên ku te pîroz dikin pîroz bikim; yên ku te nalet bikin wan nalet bikin. Wê hemû mirovên li ser ruyê erdê bi destê te bên pîrozkirin<sup>12</sup>.’”**

Xwedê, bangî zilamekî ku bi salan bû zewicandî bû û zarûkên wî nedibûn kir. Xwedê welatek pê re soz da. Wê Xwedê ew bikira neteweke mezin. Wê navê wî mezin û navdar bûya. Xwedê vana hemûyan anî cih. Belê di nav tiştên ku Xwedê ji Birahîm re got, ya herî balkêş ew bu ku wê Xwedê hemû mirovên li ser ruyê erdê bi destê Birahîm bereket bikira. Di vî sozî de, sozê dayina Mesîh jî hebû. Ji ber vê yekê diviya ku

---

<sup>12</sup> Tewrat: Tekvin/Afirandin 12:1-3

## KURÊ BIRAHÎM

Mesîh ji nîjada Birahîm bihata û wê Xwedê bi destê wî hemû dinya bereket bikira.

Ahmed got, “Tu çawa dizanî ku soz ne li ser yekî din, belê li ser Mesîh e?”

Hemdî got, “Gava ku Tewrat tê xwendin her tişt hêdî hêdî zelal dibe. Piştî demekê du kurên Birahîm çêbûn. Ji vana yek ji xanima wî Sara bû û navê wî Îshaq bû. Yê din ji xizmetkara Sarayê Xecer bû û navê wî Simaîl bû. Di gel ku Xwedê Simaîl pîroz kiribû jî, hê beriya ku Îshaq çêbibe ji Birahîm re gotibû ku wê sozê ji bo Mesîh bi destê Îshaq pêk bê:”

**‘Xwedê got, “Na. Belê wê jina te Sara kurekî bîne û tê navê wî Îshaq deynî. Ezê bi wî re û bi nîjada wî re peyman a xwe her û her bajom. Herçî Simaîl e, min tu bihîstî. Ezê wî pîroz bikim, ezê wî berdar bikim û heta tu bibêjî nîjada wî zêde bikim. Ewê bibe bavê donzdeh bavikan. Ezê nîjada wî bikim neteweke mezin. Belê ezê peyman a xwe, bi Îshakê ku wê saleke din van çaxan Sara bîne re çêkim<sup>13</sup>.”**

Ahmed got, “Rast e, Simaîlê ku Xwedê bereket kir, bû bavê Ereban. Belê em Musilman dizanin ku Xwedê ji nîjada Îshaq gellek şandî û pêxember şandine.”

---

<sup>13</sup> Tewrat: Tekvîn/Afirandin 17:19-21

## KURÊ BIRAHÎM

Hemdî gotina xwe bi vî awayî ajot, “Du kurên Îshaq çêbûn. Ev Esav û Aqûb bûn. Xwedê di xewnekê de ji Aqub re got Mesîhê ku soz hatiye dayin wê ji nîjada wî bê. Xwedê jê re weha gotibû,

**‘Xudan li ber serê wî rawest û got,’ ‘Ez Xwedê, Xudanê bavikê te Birahîm û Îshaq im. Axa ku tu li ser dimînî ezê bidim te û nîjada te. Tê bibî xwediye nîjadeke bêhesab a bi qasî toza erdê. Tê bi alî rojhilat, rojava bakûr û başûr ve belav bibî. Wê hemû gelên li ser ruyê erdê bi te û bi nîjada te pîroz bibin<sup>14</sup>.’**

Ahmed got, “Balkêş e; gava ku Xwedê bi Aqûb re dipeyive, pirraniya sozê pêşîn ê ku ji Birahîm re dabû, dubare dike.”

Hemdî got, “Sedemê vê yekê ev e ku eynî soz ji nifşekî bi nifşê din tê dayin. Çawa ku tu dibînî, Xwedê hemû gelên li ser ruyê erdê bi destê kurekî Aqûb bereket kir.”

Ahmed got, “Erê, ez dibêjim qey Mesîh cardin îspat dike ku ew naveroka esasî ya Kitêba Pîroz e.”

Hemdî got, “Ev rast e. Di nav kurên Îsraîl de gellek malbat hebûn. Ragihandina Xwedê ya ka ewê Mesîh ji kîjan malbatê be girîng e. Xwedê Dawid bijart û bi wî re peymanakê çekir. Xwedê di gellek pêxembertiyên

---

<sup>14</sup> Tekvîn/Afirandin 28:13-14

## KURÊ BIRAHÎM

de diyar dike ku ewê Mesîh ji malbata Dawid pêxember bê. Yeşaya pêxemberê ku du sed salan piştî Dawid pêxember tê, dirûvê malbata Yesse bi dara birrî ya ku tenê koka wê hatiye hêştin dixe. Navê bavê Dawid Yesse bû. Kesê ku li ser Ruhê Xwedê li ser bû, wê ji vê malê bihata. Wê vî kesî ji feqîrên li ser ruyê erdê re edalet bianiya. Wê padîşahiyeke wek cinetê bîafîranda û di wê padîşahiyê de wê herkesî Xudan nas bikira. Yeşeya weha dinivîse:

**‘Wê ji koka Yîşay şaxekî nû bavêje û ji reha wî fidanek fêkî bide. Wê Ruhê Xwedê, ruhê şahrezayî û tégihîştinî, ruhê hêz û şîretê, ruhê zanîn û tîrsa Xudan li ser wî be... Ewê feqîran bi edalet bidadîne, ji bo bindestên li ser ruyê erdê bi durustî biryar bide. Ewê dinyayê bi gopalê devê xwe ceza bike, xeraban bi hilma xwe bikuje... Wê koka Yîşay ji bo gelan bibe al, wê rojê wê netewe berê xwe bidin wî. Dera ku lê dimîne wê muhteşam be<sup>15</sup>.’**

Ahmed got, “Xwedê gotiye ku wê Mesîh ji nîjada Birahîm, Îshaq, Aqub û Dawid were. Ka em binêrin ev hatiye cih?”

Hemdî bi bişîrîn, “Gava ku em Încîlê dixwînin, em dibînin ku Mesîh tam li gor wan pêxembertiyên ku li ser wî hatine kirin, tê dinyayê. Sedemê ku Încîl bi dayina malbavkê dest pê dike jî ev e. Îspat dibe ku Mesîh bi rastî jî ji malbakva Birahîm û Dawid tê.”

---

<sup>15</sup> Tewrat, Yeşeya 11:1,2,4,10

## KURÊ BIRAHÎM

Ahmed got, “Cardin tê dîtin ku naveroka esasî ya Kitêba Pîroz Îsayê kurê Meryemê ye. Belê Hemdî divê ku tu bizanibî hê gellek pirsên min ên ku ezê ji te bikim hene. Lê em vana ji careke din re bihêlin.

“Niha bi xatirê te.”

“Oxir be hevalo.”

## XWEDÊ YEK E

Ahmed sê tiliyên destê xwe rakir û ji Hemdî re got, “Tu çi dibînî?”

Hemdî niyeta Ahmed fêm kiribû; loma bi bişirîn got, “Sê tiliyên destekî.”

Ahmed got, “Baş e Hemdî, li gor baweriya te Xwedê yek e an ku sisê ye?”

Hemdî got, “Dibe ku tu baweriya min têr baş fêm nakî. Belê divê tu fêm bikî ku baweriya min bi Xwedayê tenê ye ku erd û ezman afirandiye, bi her tiştî dizane û li her derê ye tê. Tu dizanî ku baweriya min li ser bingeha Kitêba Pîroz e û ev jî hîn dike ku Peyva Xwedê û Xwedê yek e. Ev rastî di gellek derên Kitêba Pîroz de hatiye nivîsîn.”

Ahmed got, “Belê Xwedê nikare hem sisê û hem jî yek be. Sê caran li ser hev yek, ne yek, belê sisê dikin.”

Hemdî got, “Tu çend Ahmed î, ma tu yek î an dudo yî?”

Ahmed got, “Bêguman yek.”

Hemdî got, “Xwedê tu bi ruh û bi bedenê afirand. Ma bedena te Ahmed e?”

Ahmed got, “Erê.”

Hemdî got, “Baş e, ruhê te? Ruhê te jî Ahmed e?”

Ahmed dizanibû ku wê Hemdî çi bêje, loma got, “Erê.”

## XWEDÊ YEK E

Hemdî got, “Gava ku Xwedê me di hundirê yekî de dudo afirandibe, çima ew di hundirê yekî de sisê nebe û ji bo çi ev yek bê îmkan be?” Hemdî rawest û piştî bédengiyekê cardin berdewam kir, “Em dikarin bêjin ku Xwedê yekîtiyeke tevîhev e û xwe di sê kesan de nîşan dide. Ma sê caran yek û yek li hev bê xistin, çi ye Ahmed?”

Ahmed bi bédengî got, “Yek e, belê Îsayê kurê Meryemê ne kurê Xwedê, tenê mirovek e.”

Ahmed li Hemdî nihart û weha got, “Ma Hemdî tu bawer dikî ku Mesîh kurê Xwedê ye?”

Hemdî got, “Ma tu dibêjî ez bi çi bawer dikim?”

Ahmed got, “Ez têr baş nizanim, belê ez dibêjim qey ku li gor baweriya te Mesîh ji tékiliya Xwedê ya bi Meryemê re çêbûye.”

Hemdî got, “Tu van tiştên ha ji kuderê tînî? Ez bi tu awayî bawerî bi tiştên weha naynim. Ez rastî tu bawermendekî Mesîhî yê ku bi tiştên weha bawer dikin jî nehatime.” Ahmedê ku şaş mabû got, “Baş e tu bi çi bawer dikî?”

Hemdî got, “Ez bawer dikim ku Xwedê her û her e û hê beriya ku dinyayê biafirîne li cinetê bû. Gava ku Încîl qala Mesîh dike, bi her û heriyê, bi dema ku hê Xwedê dinyayê neafirandibû dest pê dike. Încîl weha dibêje:

**‘Di destpêkê de Peyv hebû. Peyv bi Xwedê re bû û Peyv bi xwe Xwedê bû. Ew di destpêkê de bi Xwedê**



re bû. Her tişt bi wî afirî û bêyî wî tu tişt çênebû. Jiyan bi wî re bû û jiyan ronahiya mirovan bû<sup>16</sup>.”

Hemdî got, “Xwedê dinyayê bi peyva xwe afirand newsa?”

Ahmed got, “Erê, ev rast e. Xwedê got, ‘Çêbe’ û çêbû.”!

Hemdî got, “Nexwe Xwedê dinyayê bi peyva xwe afirand. Û ev peyva ku ji Xwedê derket perçekî Xwedê bû, bi hêza Xwedê ya afirandar û hemû taybetiyên wî tije bû. Di peyva Xwedê de jiyan hebû û dera ku Peyva Xwedê lê bû, jiyan bi hemû cûreyên xwe yên cihê hatibû afirandin.”

Ahmed got, “Rast e, ez vê qebûl dikim. Lê gelo, ‘Û peyv Xwedê bû’ tê çi manê?”

Hemdî got, “Heke min di dadgehekê de şahidî kiribûya, te dikaribû min ji peyvên min cihê bikira? Peyvên min, min temsîl dikirin û dibûn perçeyekî min. Niha em li vir rûdinên û dipeyivin, belê peyvên me wek perçekî me ne. Çimkî em bi peyvên xwe tînsîl dikirin. Gava ku Xwedê gerdûn afirand, peyva ku got perçeyekî wî bû. Em nikarin Xwedê ji peyva wî cihê bikin. Ev peyva Xwedê ya herheyî ya ku bi Xwedê re bûye yek û hemû taybetiyên wî di hundirîne, di kurê Meryemê Îsa de hatiye nîşandan. Loma weha hatiye nivîsîn”

---

<sup>16</sup> Încîl, Yuhenna 1:1-4

‘Û peyv bû xwîn û goşt, bi kerem û راستiyê tije di nav me de konê xwe danî. Me mezinahiya wî weha dît, wek mezinahiya Kurê yekta yê ku ji Bav tê<sup>17</sup>.’

“Hemû tiştên ku Xwedê li ser xwe gotiye, hemû taybetiyên xwe di Mesîh de nîşan daye. Xwedê pîroz e. Mirovan dît ku Mesîh çiqas saf û paqij e û di safî û paqijiya Mesîh de pîroziya Xwedê dît. Xwedê heskirin e. Gava ku mirovan dît ku Mesîh çawa ji wan hes dike, wan di wî de heskirina Xwedê dît. Xwedê dikare her tiştî bike. Ew pêkar e ku her tiştî bike. Gava ku mirovan dît ku Mesîh çawa li ser avê rêve diçe, bi bagerê re dipeyive, ba û pêlan dide rawestandî, nan diafirîne, koran qenc dike, miriyan radike, hingê bûn şahid ku hêz û berziya Xwedê di wî de tê nîşandan.”

Ahmed got, “Ma Xwedayê ku li her derê ye, çawa çêdike ku tenê di mirovekî de be. Ma gava ku Xwedê di Mesîh de bû, gerdûn jibîr kir?”

Hemdî got, “Ahmed, bifikire ku em di deryayeke bêbinî de ne û em qedexê lê dixin û tije dikin. Heke em li avê binêrin, emê bibînin ku bi ya deryayê re yek e. Eynî tişt ji bo Mesîh jî derbas dibe. Xwedayê berz û herheyî li her derê heye. Di eynî demê de wî xwe di Mesîh de bi eynî taybetî û hêzê nîşan daye. Belê ji ber ku Xwedê xwe di Mesîh de nîşan daye, ew bi sînor nîne. Xwedê hê jî bêsînor û herheyî ye.”

---

<sup>17</sup> Încîl: Yûhenna 1:14

Ahmed got, “Xwedê xwe di mirovekî de nîşan nade.”

Hemdî got, “Em çawa dikarin ji Xwedê re sînoran deynin. Em çawa dikarin bêjin ku Xwedayê berz nikare bike? Ma ew nikare her tiştî bike?”

Ahmed got, “Erê, dikare her tiştî bike. Belê ez bawer nakim ku wî xwe di mirovekî de nîşan dabe.”

Hemdî got, “Ya baş, niha em herdû jî li ser wê fikrê ne ku ev yek dikare ji bo me bêîmkan be, belê ji bo Xwedayê ku dikare her tiştî bike ne mesele ye. Eger te bi vê serboriyê nizanibûya û yekî ji te re bigota ku Xwedê xwe di devîyeke ku dişewite de nîşanî Musa daye û ji vê deviya şewitî bi Musa re peyivîye, teyê çi bigota?”

Ahmet piçekê fikirî, gava têgihîşt, ji bo Xwedayê ku xwe wek deviyekî nîşan da, xwe wek mirovekî nîşandan ne zehmet e, bi halê xwe bişirî.

Dû re Hemdî got, “Ahmed, tu li ser yê ku ji bo xwe ‘Peyva Xwedê’ û ‘Ruhê Xwedê’ dibêje bifikire; Ruhê Xwedê jî bi Xwedê re yek e. Em dizanin ku Ruhê Xwedê Meryema keç nixamt, ew bi wê bi zarû ma û Mesîh anî dinyayê. Ma milyaket Cebrayîl çi gotibû?”

**Milyaket weha bersîv da: ‘Wê Ruhê Pîroz were ser te, wê hêza yê herî berz li ser te bike sî. Ji ber vê yekê, ji yê pîrozê ku wê çêbibe re Kurê Xwedê bê gotin<sup>18</sup>.’**

---

<sup>18</sup> Încil, Lûqa 1:35

Hemdî got, “Ahmed, ya girîng kesê ku bi vî awayî hatiye dinê, kî ye. Heke tu hekîmekî dema Mesîh bûyayî û te zabita bûyina wî binivîsanda, teyê çi binivîsanda? Navê wî çi bû?”

Ahmed got, “Ez dibêjim qey minê bigota Îsayê kurê Meryemê.”

Hemdî got, “Baş e, teyê li xana diya wî çi binivîsanda?”

Ahmed got, “Minê li vir jî Meryema Bakîre binivîsanda.”

Hemdî bi bişirîn got, “Niha jî em hatin xana bavê wî.”

Ahmed devkenî got, “Bavê wî tunebû?”

Hemdî got, “Ji ber ku bavekî wî yê dinyayî tunebû, me dikaribû wê derê vala bihêştta û ji xwe bi xwe bipirsiya, ‘Ev ji kuderê tê? Yê ko ji bo wî ‘Peyva Xwedê’ û ‘Ruhê Xwedê’ tê gotin ji kuderê hatiye? Nasnama yê ku ji cinetê hatiye kî ye? Wî bi xwe weha gotiye:

‘Çimkî nanê Xwedê ew e ku ji ezmanan tê xwarê û jiyanê dide dinyayê... Nanê jiyanê ez im; her kesê ku were ba min, qet birçî nabe û her kesê ku baweriyê bi min bîne, tu caran tî nabe<sup>19</sup>.’

---

<sup>19</sup> Încîl, Yûhenna 6:33,35

‘Ew nanê jîndar ê ku ji ezmanan hatiye xwarê ez im. Her kesê ku ji vî nanî bixwe, wê her û her bijî û nanê ku ezê ji bo jiyana dinyayê bidim, bedena min e<sup>20</sup>.’

Hemdî got, “Ahmed, Îsa ji bo ku bedena xwe ji bo hemû mirovatiyê bike qurban hat. Kesê ku nanê nan bixwe, jiyana fîzîkî distîne. Belê yê ku ji nanê Xwedê yê ku ji ezmanan hatiye par distîne, jiyana ruhanî, jiyana herheyî distîne. Di hundirê mirovê ku bawerî bi Mesîh tîne û ji wî par distîne de, jiyaneke ku ji bo Xwedê tîbûnê û birçîbûnê çêdike pêk tê. Ez bi xwe vê jiyam. Mesîh, teklîfeke Xwedê ya ji bo te ye jî Ahmed.”

Ahmed bi bêdengî got, “Ez hê ji vê re ne hazir im. Di serê min de gellek fikir hene. Belê ez niha fêhm dikim ku min baweriya te ya bi Xwedê bi tevahî şaş fêhm kiriye. Ez hêdî hêdî fêhm dikim ku tu, bi Xwedayê rastîn ê ku xwe di Mesîh de nîşan daye bawerî tînî. Ez bi hemû dilê xwe ji Mesîh hez dikim, belê hê gellek pirsên min ên ku divê bên bersîvandin hene. Belê em dikarin vana di hevdîtineke xwe ya din de bipeyivin, newsa Hemdî?”

Hemdî got, “Çavê min li riya van pirsan e.”

---

<sup>20</sup> Încîl, Yûhenna 6:51

## XWEDÊ Û MIROV

Ahmed got, “Ez li ser axaftina me ya dawî gellek fikirîm. Te berê gotibû ku Îsayê kurê Meryemê mirovek e. Dû re te gotibû ku Xwedê xwe nîşanî wî daye. Ez bi rastî jî dixwazim ku hîn bibim ka ew kî ye? Mesîhê ku kurê Meryemê ye, rast e ku tu wî dikî Kurê Xwedê?”

Hemdî got, “Ahmed, bersîva vê pirsê, mifta bi Xwedê re jiyana herheyî ye. Hem niha li vir bi xwe û hem jî her û her. Heke em ji bo yekî bêjin ku Xwedê ye, ev tê wê manê ku em wî bi Xwedê re dikin yek. Belê Kitêba Pîroz nabêje ku mirovek derketiye seviya Xwedê, dibêje ku Xwedê xwe di mirovekî de nîşan daye. Em herdû jî li ser wê fikrê ne ku Mesîh bi mirovî hatiye dinyayê. Wek ku pêxemberan gotiye, ew kurê Birahîm, Dawid û Meryemê ye. Belê di gellek pêxembertiyên ku beriya Mesîh hatine kirin de, Xwedê ji me re dibêje ku ewê di şexsê Mesîh de were.”

Ahmed got, “Tu dibêjî şandî û pêxembêrên ku beriya Mesîh hatine, ji yeka ku wê Xwedê xwe di şexsê Mesîh de nîşan bide qal kirine?”

Hemdî got, “Naveroka esasî ya Kitêba Pîroz Mesîh e. Ji ber vê yekê divê em li rastiya ku Xwedê bi destê

pêxemberan li ser Mesîh ji me re diyar kiriye şaş nemînin.”

Ahmed got, “Tu vana nîşanî min bide, pirr bala min kişand:”

Hemdî beriya ku dest bi axaftina xwe bike piçekê fikirî û got, “Gava ku Xwedê 700 sala beriya bûyina Îsa, ji Mîka pêxember re li Beytlehmê bûyina Mesîh nîşan da, hingê ragihan ku, ew yê ku wê bê dinyayê, demeke pirr dirêj beriya bûyina xwe hebû.”

**‘Lê tu, ey Beytlehma Efrata, di gel ku tu di nav milên Cihûda de ne girîng î jî, yê ku wê Îsraîlê li ser navê min îdare bike ji nav te rabe. Nîjada wî pirr ji para ve diçe, digihîje destpêka demê<sup>21</sup>.’**

“Îcar Mesîh bi rastî jî li bajarê Beytlehmê hat dinyayê. Çawa ku di Încîlê de hatiye nivîsîn:

**‘Ûsiv jî ji bajarê Nisretê yê ku dikete Celîlê çû Beytlehmê, bajarê Dawid ê Cihûstanê, çimkî ew ji mala Dawid û bavêkê wî bû. Ew çû wê derê ku bi dergistiya xwe Meryemê re bê nivîsîn. Dergistiya wî jî bi zarû bû. Gava ku ew li Beytlehmê bû, çaxê zarûkanîna wê hat û wê kurê xwe yê nixûrî anî<sup>22</sup>.’**

“Ya girîng, ew kesê hê beriya ku were dinyayê hebû, kî bû. Gava ku ew li Orşelîmê bi Cihûyên hêrsbûyî re dipeyive, weha dibêje:

**‘Bavê we Birahîm bi hêviya ku roja min bibîne dilşa bû; wî ew dît û dilgeş bû. Li ser vê yekê Cihûyan jê**

<sup>21</sup> Tewrat: Mîka 5:2

<sup>22</sup> Încîl, Lûqa 2:4-7

re got, ‘Hê tu pêncî salî jî nînî; îcar te Birahîm jî dîtiye?’ Îsa ji wan re got, ‘Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, ji beriya bûyina Birahîm ez ew im<sup>23</sup>.’

“Em dizanin ku Birahîm 2000 sal beriya bûyina Îsa jiyaye.”

Ahmed got, “Heke wusa be, Mesîh dibêje hê beriya ku ew çêbibe ew hebûye. Ma li kudera kitêbên pexemberan nivîsandiye ku wê Xwedê xwe di Mesîh de nîşan bide.”

Hemdî got, “Ev di gellek deran de nivîsandiye. Pxêmeber Yeşeya ji ciyê hatina wî kesî qal dike, ku Îsayê kurê Meryemê lê mezin dibe. Ew dibêje ku wê ev kes, padîşahiyeke herheyî ya ku bi aştiya Xwedê tê salixdan, ava bike. Ew dibêje ku wê ew kes kurê Dawid be û wê padîşahiya wî her û her bajo. Pexember taybetiyên Mesîh bi navên cihê salix dide.

**‘Wê rêvebirî li ser milên wî be. Wê navê wî Şîretkarê Bêhempa, Xwedayê Hêzdar, Bavê Herheyî, Pêşewayê Aştiyê be. Ewê li ser text û welatê Dawid serweriya xwe bajo. Wê dawî li mezinbûna serwerî û aştiya wê neyê. Ewê serweriyê bi edalet û rastiyê ava ke û her her bide ajotin<sup>24</sup>.’**

“Em dizanin navên ku Xwedê dide yekî, taybetiyên wî kesî salix didin. Nexwe Ahmed, ew yê navên wek

<sup>23</sup> Încîl, Yûhenna 8:56-58

<sup>24</sup> Tewrat: Yeşeya 9:6-7



‘Şîretkarê Bêhempa,’ ‘Xwedayê Hêzdar,’ ‘Bavê Herheyî’ ‘Pêşewayê Aştiyê’ lê tên kirin, kî ye?”

Ahmed got, “Niha van gotinên ku pêxemberan, hê beriya ku Mesîh were dinyayê li ser wî gotine di hişê min de mana xwe sitandin. Ma gelo bi rastî jî tê gotin ku wê Xwedê bi xwe were wê dinyaya ku wî afirandiye?”

Hemdî got, “Yûhennayê Îmadkar bi Mesîh re di eynî demê de jiya. Ew ji alî Xwedê ve hatibû şandin ku mirov tobe bikin, bawerî bi wî binin û ew jî riya Mesîh adame bike.” Gava ku Ahmed li ser Yûhenna û armanca Xwedê ya şandina wî pirsî, Hemdî ji beşê 40. ê Yeşaya ev jêgir kir:

**‘Çimkî wê ji me re zarûkek çêbibe, wê kurek bi me bê dayin. Dengê weha diqîre: ‘Li çolê riya Xudan amade bikin, li deştê ji bo Xwedayê me riyeka rast vekin. Wê her newal bê bilinkirin, wê her çiya, her qot bê nizimkirin. Bi vî awayî wê asteng bîn rastkirin, derên asê bibin berî. Hingê wê berziya Xudan bê dîtin, wê hemû mirov bi hev re wî bibînin<sup>25</sup>.’**

Hemdî got, “Wêneyê ku pêxember Yeşeya çêdike, padîşahêkî mezin nîşan dide. Divê ku mirov ji bo wî li çolê riyêke nû û rast ava bikin. Baş e Ahmed, ev yê ku ziyaret dike kî ye?”

Ahmed bi bêdengî got, “Li gor pêxember Xudan e, Xwedayê me ye.”

---

<sup>25</sup> Tewrat, Yeşeya 40:3-5

Hemdî got, “Gava ku em ayetên pêşîn ên vê beşê bixwînin, hingê wêne zelaltir dibe.” Li vir weha dinivîse:

**‘Ey tu yê ku ji Sîyonê re mizgîniyê tînî! Derkeve çiyayê bilind! Ey yê ku ji Orşelîmê re mizgîniyê tîne! Dengê xwe bilind ke, netirse. Ji bajarên Cihûstanê re’ Vaye Xwedayê we! bêje. Vaye Xudan Yahwe bi hêza xwe tê, wê bi pêkariya xwe serwerî bajo. Destmiza wî bi wî re, xelata wî li pêş wî ye. Wê keriyê xwe wek şivan bajo, berxên xwe têxe himêza xwe, di ber dilê xwe de hilgire û hêdî hêdî rê nîşanî berxên berşîr bide<sup>26</sup>.’**

“Bi rastî jî Mesîh ji bo hemû bawermendan bi şivantî hat. Ew bi xwe weha dibêje:

**‘Ez şivanê baş im. Şivanê baş di ber miyên xwe de canê xwe dide<sup>27</sup>.’**

Hemdî got, “Baş e Ahmed, li gor pêxemberan yê ku wê bi şivantî were kî ye?”

Ahmedê ku li hember van gotinan şaş mabû weha got, “Divê ez bêjim ku Xudan bi xwe li vir tê nîşandan.”

Hemdî got, “Ahmed, tu dibînî ku ev pêxembertiyên li ser Mesîh, hemû jî di Îsayê kurê Meryemê de hatin cih. Hê beriya ku Mesîh çêbibe milyaket Cebrayîl, hat ba Zekerya, ku wê di pêş de bibûya bavê Yûhennayê Îmadkar. Milyaket ji Zekerya re got ku ewê kurekî wî

---

<sup>26</sup> Tewrat: Yeşeya 40:9-11

<sup>27</sup> Încîl, Yûhenna 10:11

çêbibe û ewê karekî wî yê taybetî hebe. Milyaket Cibrayîl weha got,

‘Çimkî ewê li ba Xudan mezin be. Ewê şerab û vexwarinên giran qet venexwe û hê ji zikê diya xwe ve bi Ruhê Pîroz tije be. Ewê ji zarûkên Îsraîlê gellekan li Xudan, Xwedayê wan vegerîne. Ewê bi Ruh û bi hêza Îlyas pêxember li ber Xudan here, da ku ew dilê bavan li zarûkan û negohdaran li şhrezayiya dilpakan vegerîne û ji Xudan re miletekî pêkhatî amade bike<sup>28</sup>.’”

Hemdî got, “Baş e Ahmed, li gor Încîlê wê Yuhennayê Îmadkar li pêş ke biçûya?”

Ahmed got, “Li pêş Xudanê ku Xwedê ye.

Hemdî berdewam kir û got, “Hê Yûhennayê Îmadkar zarûkekî nûbûyî bû Zekarya li ser wî, ango li ser kurê xwe pêxembertî kir û got,

‘Û tu jî ey zaroko, wê ji tere pêxembêre Xwedayê Herî bilind bê gotin. Çimkî tê li pêşiya Xudan herî, da ku tu riyên wî amade bikî û ji bo lêbuhurtina gunehên wan, tê xelaskirinê bi gelê wî bidî zanîn. Çimkî dilê Xwedayê me tije dilovanî ye<sup>29</sup>.’

Hemdî got, “Ahmed, ez dibêjim tu fêm dikî ku li gor gotinên pêxember Yeşeya, milyaket Cibrayîl û bavê Yûhenna Zekarîya, wê Yûhhenna li pêş Xudan here û yê ku were Xwedê ye?”

<sup>28</sup> Încîl: Lûqa 1:15-17

<sup>29</sup> Încîl: Lûqa 1:76-78

Ahmed bi awayekî ji dil got, “Erê ez vana hemûyan fêm dikim û ez dibêjim qey ev hemû bi hatina Mesîh îspat dibin.”

Hemdî got, “Erê, hem jî bi her awayî. Çaxê ku Meryema keç, li bajarê Dawid Beytlehmê Mesîh anî dinyayê, milyaketê Xudan li derveyî bajêr xwe nîşanî hin şivanan da û ji wan re weha got,

**“Milyaket ji wan re got, ‘Netirsin! Ez hatime, da ku ez mizgîniya şabûneke gellek mezin bidim we û ewê ji tevahiya millet re be. Va ye îro, li bajarê Dawid xilaskarek ji we re çêbûye. Ew jî Xudan Mesîh e<sup>30</sup>.’**

Hemdî got, “Di Încîlê de gellek caran tê dubarekirin ku Mesîh Reb e. Ew bi xwe weha dibêje:

**‘Ez û Bav yek in<sup>31</sup>.’**

Ahmed got, “Ji xwe heskirin û hurmeteke min a mezin ji Îsayê kurê Meryemê re hebû. Belê niha cara yekem e ku ez hîn dibim, bi rastî jî Mesîh kî ye û ji bo çi hatiye vê dinyayê. Hemdî, ez ji te re minetdar im ku te dema xwe da min û ev ji min re eşkere kir.”

Hemdî bi awayekî ji dil got, “Ahmed, Xwedê bi riya îman bi Mesîh anînê ji bo her tiştî bexişandin û jiyana herheyî pêşkiş dike.” Mesîhê ku mirin têk biriye û miriyan vejandî ye weha dibêje:

<sup>30</sup> Încîl: Lûqa 2:10-11

<sup>31</sup> Încîl, Yûhenna 10:30

**‘Vejîn û jiyân ez im, yê ku bawerî bi min anîbe, mirî be jî ewê bijî. Û herkesê ku dijî û baweriyê bi min bîne, qet namire<sup>32</sup>.’**

Hemdî got, “Ahmed, tu îman bi vê tînî û diyariya Xwedê Mesîh bi îmanê qebûl dikî?”

Ahmedê ku hêstir ketin çavan, weha got, “Erê, ez niha hîs dikim ku ew li ber derê min rawestiye û li derê min dixê. Ma gelo ez çawa dikarim diyariya Xwedê qebûl bikim?”

Hemdî got, “Ev qet ne zor e. Tu bi gotinên xwe ji Xwedê re dua bike. Her tiştî jê re bêje. Ji xwe Xwedê her tiştê li ser me dizane. Bi wê qurbana ku Mesîh di ber te de daye lêborînê qebûl bike. Dua bike ku Xwedê bi saya Ruhê Pîroz were dilê te û ji te re bibe alîkar ku tu Mesîh wek şagirtekî bişopîni. Vê duayê bi navê Mesîh bike. Mesîh bi qurbana ku daye, di navbera te û Xwedê mabeynkar e. Kitêba Pîroz dibêje, gava ku tu Mesîh bi vî awayî qebûl bikî, tê ji nû ve werî dinyayê. Hingê tê ji Xwedê jiyaneke nipînu bistîni. Bi saya Mesîh, tê bi Xwedê re bikevî nav têkiliyeke nû. Bi vî awayî wê Xwedê bibe Bavê te û tê jî bibî Kurê wî. Çimkî di Încîlê de, ji bo her kesê ku Mesîh qebûl dike weha tê gotin:

**‘Lê hemû yên ku ew qebûl kirin û bawerî bi navê wî anîn, wî desthilatî da wan ku bibin zarûkên Xwedê<sup>33</sup>.’**

---

<sup>32</sup> Încîl, Yûhenna 11:25-26

<sup>33</sup> Încîl, Yûhenna 1:12

Gava ku bi hev re dua kirin û sipasî dan Xwedê, Hemdî bi ruyekî dilgeş weha got, “Tu bi xêr hatî malbata me. Niha bi destê Mesîh, em hemû di malbata Xwedê ya mezin de bira ne.”

Ahmed bi şahî got, “Ez çiqas ji te re sipas bikim hindik e.”

Hemdî got, “Ji Xwedê re sipas bike û her roj vê bike. Bi kesên ku wek te Mesîh dişopînin re hevpariyê bike. Niha tu dikarî wê duaya ku Mesîh ji bo şagirtên xwe kiriye bikî:

**‘Bavê me yê li ezmanan,  
bila navê te pîroz be.  
Bila padîşahiya te bê.  
Daxwaza te wek li ezmanan,  
li ser rûyê erdê jî bi cih bê.  
Nanê me yê rojane roj bi roj bide me.  
Û li deynên me bibihûre,  
wek ku em li deyndarên xwe buhurîne.  
Û me nebe ceribandinê,  
lê me ji yê xerab xilas bike.  
Çimkî padîşahî, pêkarî û rûmet,  
Her û her yên te ne. Amîn<sup>34</sup>.’**

---

<sup>34</sup> Încîl: Metta 6:9-13

## KUPONÊ XWENDEVAN

Xwendevanên hêja,

Heke weşana me bala te kişandibe û te feyde dibe, ev yek wê me memnûn bike. Hê kitêbokên me yên dinên wek vê jî hene. Heke hûn lista kitêban û broşora danasîne dixwazin, ji me re binivîsîn. Heke pirseên we li ser bawariyê û tiştên weha girîng hebin, em li benda nama we ne. Emê ji her xwendevanê xwe yê ku anketê dagire re diyariyeke biçûk bişînin.

**Anket-Ji kerema xwe re ya ku li gor we ye îşaret bikin.**

1. We ziman û mijara kitêboka **Ji Min Re Qala Mesîh Bike** çawa dît?

Hêsan

Navendî

Zor

2. Temenê we?

Jiyê we-ji 18-an biçûktir |  18-25  26-40  Ji 40-î mezintir

3. Perwerde ya we?

Seretayî

Navîn

Lîse

Bilind

4. Cînsiyeta we?

Keç

Kur

5. Halê we yê medenî?

Ezep

Zewicandî

6. Ez dixwazim hûn kursa nameyî ya Încîlê ya belaş bişînin navnîşana min?

Erê

Na

7. Ez dixwazim ku hûn lista kitêb û broşoran bişînin navnîşana min.

Erê

Na

Nav, Paşnav:.....

Navnîşan:.....

.....

Bajar:.....

Vî rûpelî bibirin û bişînin navnîşana:

**P.K. 8 Acıbadem  
Kadıköy - İstanbul**